



Destana
**KELA DIMDIM
Û XANÊ LEZÊRÎN**

Vekolîneke Edebî û Dîrokî

YAŞAR KAPLAN

DESTANA KELA DIMDIM Û XANÊ LEPZÊRÎN

Nûbihar

Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti. Büyük Reşitpaşa Cad.
Yümni İş Merkezi No: 22/29 Vezneciler-Fatih/İstanbul
Tel & Faks: 0212 519 00 09
www.nubihar.com | email: nubihar@gmail.com
Yayın Sertifika No: 16919

Weşan No: 284 | Edebiyat-Folklor

Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn
~Vekolîneke Edebî û Dîrokî~

Yaşar Kaplan

ISBN: 978-605-9413-63-3

Çapa Yekem: 2019

•
Gerînendeyê Weşanê

Süleyman Çevik

Edîtor

Yunus Dilkoçer

Berg

İHB Reklam Ajansı

Mîzanpaj

Dawud Rêbiwar

•
Çapxane

Alioğlu Bas. Yay. ve Kağ. San. Tic. Ltd. Şti.

Orta Mah. Fatin Rüştü Sk. No: 1-3/A

Bayrampaşa/İstanbul

Tel: 0212 612 95 59

**DESTANA KELA DIMDIM
Û XANÊ LEPZÊRÎN**

~Vekolîneke Edebî û Dîrokî~

Yaşar KAPLAN

Nûbihar

Yaşar Kaplan li gundê Seranî (Baştepe) yê ser bi Çelê (Çukurca) ya navçeya Culemêrgê hatiye dinê. Xwendina xwe ya seretayî li Culemêrgê qedand. Di sala 2004ê ji Zanîngeha Selçûkê ji beşa Îlahiyatê derçû. Di sala 2011ê de li Zanîngeha Wanê Yüzüncü Yılê di Enstîtûya Zanistên Civakî Makezanista Felsefe û Zanistên Dînî de bi navê “Êzdiyatîya Îroyîn” teza xwe ya masterê qedand. Herwesa di sala 2015an de li heman zanîngehê di beşa “Ziman û Çanda Kurdî” de teza bi navê “Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn, Lêkolîneke Edebî û Dîrokî” ya masterê qedand. Pirtûkên wî yên bi navê “Günümüz Yezidiliği” û “Kaniya Stranan” di nav weşanên Nûbiharê de çap bûne. Di bin banê Zanîngeha Hakkariyê xebatên xwe yên edebî, dîrokî û berhevkirina kelepura Kurdî didomîne. Nivîskar zewicî ye û babê sê zarokan e.

NAVEROK



Pêşgotin	7
Çend Têbinî	9
1. Destpêk	11
1.1. Destan.....	14
1.1.1. Di Edebiyata Kurdî da Destana Kela Dimdim	15
1.1.2. Xebatên li Ser Destana Kela Dimdim	16
1.1.3. Jêderên Me.....	18
1.1.4. Ji Aliyê Ruxsarî ve Destana Kela Dimdim.....	19
2. Naveroka Destana Dimdim	21
2.1. Destana Dimdim ya Dîrokî.....	21
2.1.1. Cih û Dem	21
2.1.2. Emîrxan û Biradostî	21
2.1.3. Bûyer.....	23
2.1.3.1. Kela Dimdim.....	25
2.1.3.2. Amadekariyên Şerî.....	26
2.1.3.3. Destpêka Şerî.....	27
2.1.3.4. Xanê Lepzêrîn û Osmanî.....	29
2. 2. Destana Dimdim ya Çîrokî.....	30
2. 2. 1. Cih û Dem	30

2. 2. 2. Kes û Leheng	31
2. 2. 3. Kurtiya Destanê.....	32
3. Temayên Destana Kela Dimdim	41
3.1. Kurdîni û Welatparêzi	41
3. 2. Dilsozi û Xiyamet	44
3. 3. Dîn û Bawerî.....	46
3. 4. Jin.....	48
3. 5. Ray û Tedbîr	51
3. 6. Xîret û Hemaset	53
4. Metnê Destanê	55
4.1. Beşa Yekem.....	57
4.2. Beşa Duyem.....	62
4.3. Beşa Sêyem.....	69
4.4. Beşa Çarem.....	83
4.5. Beşa Pêncem	94
4.6. Beşa Şeşem.....	103
4.7. Beşa Heftem	118
5. Encam.....	155
Jêder	157
Ferhengok	158

PÊŞGOTIN



Di van dused salên dawiyê da Edebiyata Kurdî di rewşeke awarte û metirsîdar ra derbas bûye. Ji ber rewşa Kurdan ya siyasî û polîtîk Edebiyata Kurdî wekî edebiyatên gelên din di rewşeke normal ra derbas nebûye. Çunkî edebiyatên gelên din bi piştgiriya dewletên xwe yê neteweyî ve pêşveçûn û berfirehbûna xwe ya asayî bi rê ve birine. Lêbelê Edebiyata Kurdî nebûye xwedanê vê îmkanê. Vê rewşê herçend karîgeriyên neyînî li ser ziman û edebiyata Kurdî kiribe jî edebiyata Kurdî bi temamî ranewestayê û pêşveçûn bi dest êxistiye.

Wekî tê zanîn edebiyata Kurdî li ser çar hêmanan hatiye avakirin: ziman, edebiyata klasîk, edebiyata nûjen û edebiyata devkî. Ji van hêmanan ya jî hemiyar dewlemendtir edebiyata devkî ye. Edebiyata devkî wekî tete zanîn malê gel e û di nava gel da belav e. Piştî serdema modern parastina edebiyata devkî ya di nava gel da serdest bi metirsiya nemanê ve rûbirû maye. Taybetî gelên bê desthilatdar û bûne armancên bişaftinê zêdetir bi vê metirsiyê ra rûbirû mane. Kurd jî yek ji van neteweyan in. Heta niha di warê edebiyata devkî da jî aliyê vekolîner û pisporên biyanî û xuyanî ve herçend xebat hatibin kirin jî ji ber rewşa Kurdan û Kurdî gelek kêmasiyên van xebatan çêbûne. Lewra divê bi çavekî zanistî edebiyata devkî bê tomarkirin û ev materyalên hatî tomarkirin bi çavekî zanistî bêne tûjandin, senifandin û nirxandin. Me jî xwest di vê xebata xwe da yek ji girîngtirîn destana neteweyî ya edebiyata Kurdî, Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn ya di nava gel da tomar bikin û binirxînin. Me, ev destan li devera Hekariyan ji

devê deh dengbêj û beytbêjan wergirt û nivîsî. Ji ber ku ev destan di aliyekî din li ser bûyereke dîrokî hatiye avakirin, me xwest li dû deqên dîrokî gîvilê (sîlûetê) destanê yê dîrokî jî derxin meydanê. Ji bo vê çendê jî me îstifade ji jêderên destê yekê wergirtin.

Di amadekirina vê xebatê da şewirmendê me birêz Alk. Doç. Dr. M. Metin Barlık gelek harîkariya me kir. Em gelek minetdarên wî ne, mal ava. Herwesa serokê beşa Kurdî ya Zanîngeha Yüzüncü Yılê birêz Alk. Doç. Dr. Nesim Sönmez jî di amadekirina vê xebatê da harîkarî da me. Di wergerandina hinek deqên Farişî da Mamosta Nizar Eyûb Gulî teqşîrî nekir. Spasiya herdu mamostayên birêz dikin. Hevalên wekî Ayhan Geverî, Îlyas Sıvağcı û Reşîd Yıldız jî di amadekirina vê xebatê da bi xwendin û nirxandinên xwe yên hêja ve harîkarî dane me. Di destpêka berhevkirina vê xebatê da hêj di dema lêgerîn û qeydkirina destanê da hevalên wekî Cengîz Şen, Îhsan Akın û Mûrad Adıyaman gelek harîkariya me kirin. Gelek spasiya wan jî dikin. Herwesa biramezinê me birêz M. Xalid Sadîni ji bo serastkirina pirtûkê gelek harîkarî da me. Spasiyên taybet lê dikin. Dawiya dawî gelek spasiya hevjin û herdu lawên xwe dikim. Hêvîdar im vê xebatê şiyabe xizmeta edebiyata Kurdî bike.

Yaşar KAPLAN
Culemêrg 2017

ÇEND TÊBINÎ

Ev destan li devera Hekariyan hatine komkirin. Lew taybetiyên devoka Hekariyan di nava xwe da dihewîne. Ji bo sûdwergitineke baş, em fer dibînîn behsa çend taybetiyên vê devokê bikin:

-Veqetandeka diyar ya pirjimariyê ne wekî “ên” lê wekî “êd” hatiye bikarînan. “Çavên min” wekî “Çavêd min” tê gotin.

-Di devoka Hekariyan da cinavkên kesandinê wiha têne gotin:

Ez diçim, Tu diçî, Ew diçît/diçîtin, Em diçîn, hûn diçin, ew diçin.

-Lêbelê kesandina çar lêkeran “Kirin”, “Birin”, “Dan”, “Xwarin” ji yên di cudatir in. Qertafên kesandinê yên van çar peyvên wiha ye:

Ez dikem, Tu dikey, Ew diket/diketin, Em dikeyn, hûn diken, Ew diken

Ez dibem, Tu dibey, Ew dibet/dibetin, Em dibeyn, hûn diben, Ew diben

Ez dixwem, Tu dixwey, Ew dixwet/dixwetin, Em dixweyn, hûn dixwen, Ew dixwen

Ez didem, Tu didey, Ew didet/didetin, Em dideyn, hûn diden, Ew diden

-Wekî li jorî diyar dibit; qertafên birra yekem: (im, î, ît-îtin, in, in-in) û birra duyem jî: (em, ey, et-etin, eyn, en-en) e.

-Herçendî di devoka Hekariyan ya rojane da nemabît jî di destana me komkirî da daçekên “li, ji, bi” wekî “le, je, be” dihatine bilêvkirin. Bo nimûne “le min” wekî “li min” di hate gotin. Lêbelê me ev daçek ne wekî beytbêjan gotî, wekî axiftina rojane ya niha nivîsîn.

-Herwesa di orjînalê destanê da qertafa dema niha “di” jî wekî “de” di hate bilêvkirin. Bo nimûne “ez diçim” wekî “ez deçim” di hate gotin. Lêbelê ji ber ku ev forme di axaftina rojane ya Hekariyan da nedihate bikarînan me jî wekî “di” nivîsî.

-Di bendên destanê da bo hev girtin û lêkhatina kêşeya ristan,

hinek deng/herf ji ristan hatine avêtin. Hindî ji me hatî, me tîpên/dengên keftî di nava kevanan da aşkera kirin. Heke tîp ne ji lêkeran keftîbin me tîpên keftî wergirtin nava kevanê herwekî “ç[î] ya.” Lêbelê heke tîp ji qertafa demî ya lêkerê an jî ji daçekan kefti bin hîngê jî me bi bendikê ve diyar kirin. Wekî: “dibînim: d’bînim” an jî “ji min: j’min.”

-Gihaneka “û” ji bo lihevhatina kêşeyê hinek caran wekî “w” hatiye bilêvkirin. Wekî “Xudê û Resûl”: “Xudê w Resûl.”

KURTEBÊJE

B.n.b.:	Berhema Nav Borî
Bnr.:	Binêre
Brh.:	Berhevkar
DÎB.:	Diyanet İşleri Başkanlığı
dq.:	Deqîqe
Ed.:	Edîtor
H.:	Hazretî
m.:	Mirin
r.:	Rûpel
S.:	Silavên Xwedê lê bin
Wer.:	Wergêr
Weş.:	Weşanxane

1.DESTPÊK



Destan yek ji kevintirîn cûreya edebiyata devkî ye. Di serdemên gelek kevin da derkeftiye meydanê. Mijarên destanan ji bûyerên dîrokî û civakî yên li ser civakan gelek karîger pêk tên. Destan, gelêrî ne, danêrên wê yên pêşiyê nahêne zanîn. Lewra destan wekî malê gelekî têne hesabandin. Edebiyata Kurdî ya gelêrî ji aliyê destanan ve dewlemend e. Lêbelê ji bextê Kurdan ê reş; dema destan li nava Kurdan da gelek belav bû kes nebû van destanan tomar bike û dema vekolerên bikarin van destanan bi awayekî zanistî berhev bikin derkeftin, hîngê jî kesên ku beyt û destanan jiber dizanin gelek kêmbûn. Heta niha gelek xebat ji aliyê vekolînerên biyanî û xuyanî ve li ser edebiyata gelêrî ya Kurdî hatibin kirin jî ji ber rewşa Kurdan û Kurdî ya siyasî, ev xebat ne rêkûpêk in. Lewra ev vekolîn di asta pêdivî da nînin. Der barê cûr û numûneyên edebiyata gelêrî ya Kurdî da endîşeya wendabûn û jibîrkirinê her daîm li kar bû. Bi rastî dema mirov lê dinêre ev endîşe ji sedî sed ne rast e. Lêbelê kêmbûna vekolînên zanistî li ser folklorê Kurdî wekî metirsiyekê hêj berdewam e.¹ Piştî piçek başbûna rewşa Kurdan û Kurdî ya siyasî, bizavên vekolînê der heqê edebiyata Kurdî ya gelêrî da zede bûn. Ev xebata me jî dixwaze di vê babetê da valahiyeke zanistî tijî bike.

Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn yek ji girîngtirîn destanên Kurdî ye. Ev destan, destaneke neteweyî ya Kurdî ye û beh-

¹ Perteve, Ramazan, “Danasîn û Rewşa Giştî ya Xebatên li ser Folklor û Edebiyata Kurdî ya Gelêrî”, *Edebiyata Kurdî ya Gelerî, Dîrok- Teori- Rêbaz- Lîteratur- Berawirdî- 1*, Weş. Avesta, Stenbol 2015, r. 14, 15.

sa mêrxasî û hemaseta Kurdan dike. Her ji piştî rûdana Kela Dimdim hatiye honandin û di nava civaka Kurdî da û Kurdistanê belav bûye. Çunkî ev destane ji hemî aliyên Kurdistanê hatiye vegotin û guhdarîkirin. Belkî kêma destanan hindî vê destanê îmkana belavbûnê dîtibin. Gelek sebebên hezkirin û belavbûna vê destanê di nava gel da hene. Lêbelê wesa diyar e sebaba vê çendê ya ji hemîyan mezintir ew e ku ev destan behsa mêrxasî û qehremaniya Kurdan dike. Ev hemaseta neteweyî ji bo hezkirin û belavbûna vê destanê rê xweş kiriye.

Armanca vê vekolînê her wekî me li jorî jî gotî dewlemendkirina vekolînên li ser edebiyata Kurdî ya gelêrî ye. Lewra me xwest em vê destana girîng serejinû bi çavekî zanistî vekolin. Tomarkirin û tûjandina metaryalên edebiyata devkî karekî gelek giran e. Heke ev xebat li zimanekî wekî Kurdî, rastî êrîşên tunekirinê hatî kirin be, ev zehmetî hêj zêdetir dibe. Lewra pêdivî ye xebatên tomarkirin û tûjandina berhemên edebî yên gelerî li dû sistemê û rêbazekê bêne kirin.

Wekî rêbaz me xebata xwe hem ji aliyê mijarê ve hem jî ji aliyê mekanî ve tixûbdar kir. Xebata me dê li ser varyantên Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn yên li devera Hekariyan da be. Lewra dengbêj û beytbêjên ev destan digotin ji vê deverê hatine destnîşankirin. Me, ev destan ji deh dengbêj û beytbêjên cuda yên li devera Hekariyan tomar kir. Pêşiyê me dengê wan qeyd kir û paşî jî ev qeyd deşifre kirin. Ji ber ku ev dengbêj û beytbêje hemî yên devereke bûn, di navbera varyantên vê destanê da cudahiyan pir hindik hebûn. Lêbelê em dikarin bibêjin van varyantên cuda hemîyan, hevdu temam dikirin. Hinek hûrgiliyên li cem varyantekê heyî dibû ku li cem ya din nebe. Cudahiya van varyantan zêdebarî di kurtbûn û dirêjbûna destanê da derdikefte meydanê. Çunkî hinek bûyer û hûrgiliyên varyantekê digot dibû ku di varyanta din da nebû. Lêbelê dema me ev varyantên cuda hemî li ser hev kom dikirin, vê çendê honak û rista bûyeran ya destanê birêkûpêktir dikir. Bi saya wekî yek destan komkirina van varyantan gîvilê (sîlûetê) destanê xweştir xuya dikir. Yanî heke em bi awayekî din bibêjin, ev varyant hinek kêma hinek jî têr û tijîtir bûn. Dema me varyant hemî berawird kirin me dît ku her vala-

hiyeke di varyantekê da bi saya varyantên din tijî dibe. Û bi vî awayî serûberê destanê bi rêkûpêktir derdikefte meydanê. Lewra me her varyant serbixwe vekolîn nekir, berevajî vê, me ev varyant hemî wekî varyantekê dirist kir û paşî vekolîna xwe li ser kir. Ji bo vê çendê du palderên girîng hebûn: destan di heman herêmê hatiye komkirin û hema hema dengbêj û beytbêjan heman bendên wekî hev digotin.

Ev xebata me ji pênc beşan pêk têt. Di beşa yekem da wekî cûreyekî edebî li ser destanê hate rawestan. Piştî danasîna destanê, behsa destanên di edebiyata dinyayê û di edebiyata Kurdî da û cûrên destanê û merheleyên avabûna destanan hate kirin. Cihê destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn di edebiyata Kurdî da hate destnîşankirin. Di vî babetî da li dor xebatên li ser vê destanê avabûyî yên di edebiyata klasîk ya Kurdî da, hate rawestan. Xebatên vekolîner û nivîskarên biyanî û xuyanî yên heta niha li ser vê destanê hatine kirin, me di vê beşê da destnîşan kirin. Herwesa jêderên me ev varyantên mijara vê xebatê dane nasîn.

Di beşa duyem da li ser naveroka Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn hate rawestan. Ji ber kû ev destan li ser rûdaneke dîrokî hatiye avakirin, me jêderên dîrokî yên behsa vê bûyerê dikin nirxandin. Hindî ji me hatî me xwest em perdeya li ser rûdana dîrokî bidin aliyekî û bûyerê raçavî xwendevanan bikin. Ji bo vê çendê me jêderên destê yekê bi kar anîn. Lêbelê divêt em ji bîr nekin herçend ev destan li ser bûyereke dîrokî ava bibît jî destan û efsaneyek li ser vê rûdana dîrokî hatiye avakirin. Lewra me naveroka destanê li dû jêderên devkî jî nirxand. Nirxandina dualî, hem dîrokî hem jî çîrokî, wekhevî û cudahî di halê xwe da derêxistin pêş me. Di van nirxandinan da cih, dem, leheng û honaka destanê derkefte meydanê.

Di beşa sêyem da temayên di destanê da serdest hatin vekolîn-kirin. Di nirxandinên me da temayên wekî Kurdîni û welatparêzî, dilsozî û xiyamet, dîn û bawerî, jin, tedbîr û ray, xîret û hemaset derkeftin pêş. Di beşa çarem da metnê destana me li devera Hekariyan li ser devê deh dengbêj û beytbêjên cuda tomarkirî hate nivîsîn. Wekî beşa dawî encamên vê xebatê yên hatine bidestêxistin, hatine rêzkirin.

1.1.DESTAN

Destan, cûreyekî edebî yê kevin e. Peyva “Dastan an Destan” peyveke Îranî ye. Di Kurdî da hem peyva destan hem jî peyva “Beyt, Qiset, Qewl” têtê bikaranîn. Li hemberî vê peyvê li Rojava “epos” têtê bikaranîn. Epos bi ‘eslê xwe Grekî ye û têtê maneya çîrokên menzûm. Epos, ew serboriyên wesifdar û derasayî yên xweda, xwedawend, wekxweda û lehengan e ku bûyerên mezin ên qewimîne û di bîra civakê da bi cih bûne². Di destanan da bûyerên dîrokî û civakî yên karîgeriyeke mezin li ser civakê hiştî bi awayekî menzûm têne vegotin. Di jiyana neteweyan da gelek serhatiyên rengvedana wan bi borîna demê ra nehên jibîrkin hene. Ev serhatî dibît ku şerek an qehremaniya şexsekî an jî afeteke li kûrahiya civakê şopa xwe hiştî be. Ev serhatî bi rêka destanê ve têne rengînkirin û dewlemendkirin. Ji bo ku bi sanahîtir di bîra civakê da bête parastin bi awayê menzûm û rewanbêjî têne vegotin.

Wekî têtê zanîn destan di sê qonaxan ra derbas dibin. 1. Derketina Destanê: di vê qonaxê da hinek bûyerên dîrokî û civakî diqewimin û ev bûyer di xeyal û şuûra netewê ya hevpar da teşe digire. Kesên di van bûyeran da cih girtî di xeyala civakê da cihekî girîng digirin. 2. Belavbûn: bi dewlemendkirina bûyer û lehengan ve destan belav dibît û nifş bo nifşî têtê veguhastin. 3. Tomarkirin: di vê qonaxê da destan ji aliyê hunermendekî an jî pisporekî ve têtê nivîsîn û tomarkirin.³

Destan di nava xwe da wekî destanên xweristî û destanên çêkirî dabeş dibin. Destanên xweristî ji bûyerên kevin yên karîgeriyeke mezin li ser bîra civakê hiştî pêk tînin. Ev cûre gelêrî ne û danerê wan ne diyar e. Lewra wekî malê gel an netewekê têtê hesabkirin. *Gilgamişa* Sûmeriyân, *Kalavelaya* Fîniyan an jî *Memê Alanê* Kurdan numûneyên vê cûrê ne. Destanên çêkirî jî ji bo destanên ji aliyê helbestvanekî ve hatine çêkirin, têtê gotin. *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî û *Bihuştaya Wenda* ya Milton em dikarin bo vî cûreyî wekî mînak bidin.

2 Pertev, Ramazan, *b.n.b.*, r. 221, 222.

3 Yetiş, Kazım, “Destan”, *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, İstanbul 1994, r. 9/202.

Destan bi sê awayan hatine honandin. Hinek menzûm (helbestkî), hinek pexşan, hinek jî ji menzûm û pexşana tevlihev hatine honandin. Di edebiyata Kurdî da destan li dû naveroka xwe dibin sê beş: Destanên mîrxasiyê wekî *Destana Kela Dimdim*, *Şerê Kolana Qumriyê*; destanên evînê wekî *Memê Alan*, *Ferx û Sîrî*, *Sînemxan*; û destanên ayînî wekî *Hespê Reş*, *Kekemîr*, *Avdel Ūmeran*, *Şêxmend*, *Zembîlfiroş*.

1.1.1. Di Edebiyata Kurdî da Destana Kela Dimdim

Di edebiyata Kurdî da destana mîrxasî, qehremanî û welatparêziyê ya ji hemiyana mezintir û belavtir destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn e. Vê destanê ji ber naveroka xwe ya têtê tijî û uslûba xwe ya rewanbêjî cihekî taybet girtiye. Lewra di nava Kurdan da gelek belav bûye û ji aliyê civaka Kurdî ve gelek hatiye hezkirin. Ev destan hem ji aliyê beytbêjan ve hatiye gotin hem jî ji aliyê hinek edîbên klasîk ve hatiye nivîsîn. Mela Mehmûdê Bazîdî di vî babetî da wiha dibêjî: “*Ev qezîya şerê Kela Dimdim qewî meşhûr û me’rûf e di Kurdistanê da... Ekserê Kurdan wê destanê di meclîsan da dixwînin û ji boyê şehîdêd Kela Dimdimê heyf dixwen û digirîn û duayê dikin.*”⁴

Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn ji aliyê çend edîbên edebiyata Kurdî ya klasîk ve hatiye nivîsîn. Hindî em dizanîn cara pêşiyê yê ev destan nivîsî Feqiyê Teyran e (m. 1632). Ev destan ji şêst û heft malikan pêk têtê. Ev destan û berhemên Feqiyê Teyran ji aliyê M. Xalid Sadîni ve hatine tomarkirin û çapkirin.⁵ Ew di berhema xwe da dibêje ku: “*Bi gotina Ebdurreqîb Yûsif ev destan ji berhemê Feqiyê Teyran e û wî (E. Y.) ev destane berhev kiriye û çap kiriye.*”⁶ Wesa diyar e ev destana Feqiyê Teyran kêm e û hêj bi temamî negehiştiye destê me. Mela Mehmûdê Bazîdî jî di berhema xwe ya bi navê *Cami’eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê*

4 Mela Mehmûdê Bazîdî, *Cami’eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, (Brh: Ziya Avci), Weş. Lis, Stenbol 2010, r. 117.

5 M. Xalid Sadîni, *Feqiyê Teyran, Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, Weş. Nûbihar, Stenbol 2010, r. 383- 397.

6 M. Xalid Sadîni, *b.n.b.*, r. 58.

Kurmancî da di bin navê “Hîkayeta Sîûçaran” da kurteya destana Kela Dimdim nivîsiye. Ew di vê nivîsa xwe da dibêje Melayê Bateyî li ser destana Kela Dimdim qiseyê mewzûn destanek însa kiriye.⁷ Lêbelê îhtimal e ev destan her ya Feqiyê Teyran be.

Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn di edebiyata nûjen ya Kurdî da jî wekî mijar hatiye bikaranîn. Mustafa Salih Kerîm di sala 1960 da bi navê *Şehîdanî Qelay Dimdim* romanek nivîsiye û li Silêmaniye çap kiriye. Herwesa Erebe Şemo di sala 1966an da bi navê *Dimdim* romanek nivîsiye. Jan Dost jî bi navê *Kela Dimdimê* pirtûkeke helbestan nivîsiye û li sala 1991ê li Bonnê di nava weşanên Rewşen derkeftiye.⁸

1.1.2. Xebatên li ser Destana Kela Dimdim

Wekî tê zanîn destana Dimdim li ser rûdanê dîrokî hatiye çêkirin. Lewra ev bûyera dîrokî di berhemên dîrokî da hatiye vegotin. Yekemîn kes û tekakesê behsê vê bûyerê kirî Îskender Beg Turkmanê (1561- 1635) waqanivîsê Şah Ebbasê Sefewî ye (1571-1629). Ew bixwe di şerê Dimdimê da amade bûye. Serhatiya şer di berhema xwe ya bi navê “*Alem-arayê Ebbasî*” da vegotiye. Ji hingê heta îro gelek kesên biyanî û xuyanî li ser vê bûyerê û destanê rawestane. Lewra lîteratûreke berfireh li ser Destana Dimdim çêbûye. Em dikarin kesên xebat li ser vê destanê kirî wiha rêz bikin:⁹

Feqiyê Teyran: *Kela Dimdim*

Mela Mehmûdê Bazîdî: *Cami'iyê Rîsaleyan û Hîkayetan*

Alexander Jaba: *Recueil de Notices et Recits Kourdes*, St. Petersburg 1860.

7 Mela Mehmûdê Bazîdî, *b.n.b.*, r. 114- 117.

8 Çalîştiran, Rûken, “Lîteratûrek Li Ser Destanên Kurdî”, *Edebiyata Kurdî ya Gelerî, Dîrok- Teorî- Rêbaz- Lîteratur- Berawirdî- 1*, (Ed. Ramazan Pertev), Weş. Avesta, Stenbol 2015, r. 241.

9 Ji bo berhevkirina vê listê îstifade ji van jêderan hatiye kirin. Bnr: Zilan, Reşo, “Vekolînek Li Ser Destana Kela Dimdimê”, *Edebiyata Kurdî ya Gelerî, Dîrok- Teorî- Rêbaz- Lîteratur- Berawirdî- 1*, (Ed. Ramazan Pertev), Weş. Avesta, Stenbol 2015, r. 193- 195; Çalîştiran, Rûken, “Lîteratûrek Li Ser Destanên Kurdî”, *Edebiyata Kurdî ya Gelerî, Dîrok- Teorî- Rêbaz- Lîteratur- Berawirdî- 1*, (Ed. Ramazan Pertev), Weş. Avesta, Stenbol 2015, r. 223- 241.

Eugen Prym, Albert Socin: *Kurdische Sammlungen Erzählungen und Lieder in den Dialekten des Tur Abdin und von Bohtan*, St. Petersburg 1887- 1890.

Oskar Mann: *Die Mundart Mukrî- Kurden*, Berlin, 1906-1909.

M. A. Zekî: *Amîr Xanî Bradost û Qelay Dimdim*, Kovara Gelawêj, 1940.

Heciyê Cindî: *Folklorê Kurdî*, Erîvan 1957.

Mihemed Teefîq Werdî: *Qalay Dimdim*, Bexda 1961.

Qanatê Kurdo: *Hîkayet û Stranên Qehremaniyê yên Kurdî*, Moskova 1962.

Casimê Celîl: *Destana Dimdim (Klamê Çiya)*, Erîvan 1970.

Mohamed Taqî Danespazuh, *Seh Senadê Tarîkî wa Jografiya î-ê Dewran-ê Sefewî*, kovara Wahîd, 1971.

M. Pedram, *Ber Ferazê Dimdim*, Kovara Huner û Merdimê, 1975.

Prof. Dr. Ordîxanê Celîl: *Êposa Cimeta Kurda ya Mêrxasiyê-Xanê Çengzêrîn*, teza doktorayê, Moskova 1967; digel Celîlê Celîl di nav Zargotina Kurdî jî belav kirine. Moskova 1978.

H. Huseynî, *Beytî Dimdim*, 1981.

Cemîl Ehmed Zêro: *Şoreşa Dimdim*, Bexda 1983.

Ebdulla Merdux: *Rasperînî Dimdim û Qelaçoy Kurdanî Mukrî*, Kovara Hêvî, 1983.

M. M. Hamabor, *Xanê Lepzêrîn û Kelayê Dimdim*, Kovara Roşînîrî, 1984.

Riza Çolpan, *Destana Dîroka Kurd û Kurdistan*, Sidney 1995.

Reşo Zilan, *Destanên Kurdî*, Stockholmê 1996.

Muhsîn Kizilkaya, *Kayıp Dîwan*, Stenbol 2000.

Sadiq Bahadîn Amêdî, *Ji Folklorê Kurdî*, Hewlêr 2002.

Mihemmed Ebdullah, *Beytên Kurdî*, Dihok 2002.

Serwer Abdurehman Omer, *Karesata Qelay Dimdim (1608-1609)*, Silêmanî 2008.

Yasîn Hesên Goran: *Pênc Dastanê Kurdewarî*, Hewlêr 2011.

Giulia Ferdeghini: *Kelaê Dimdim Descrizione e Analisi di un Poema Epico Della Letteratura Orale Curda a Partire Dalla Documentazione Raccolta Nel Bahdînan e*, teza doktorayê, Roma 2012.

Amir Hassanpour, *Beyt û Dimdim*, Encyclopaedia Iranica.

1.1.3. Jêderên Me

Destana mijara vê xebatê yanî destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn, li devera Hekariyan ji devê deh dengbêj û beytbêjên cuda hatiye tomarkirin. Ev destan bi rêka denggirê ve hatiye qeydkirin û paşê jî hatiye deşîfrekirin. Ji van deh varyantên cuda, pênc varyant destanê bi temamî vedibêjin. Di pênc varyantan din da jî hinek ta û çiqên destanê hatine vegotin. Kesên me destan jê wergirtî li herêmê wekî beytbêj û dengbêj tene nasîn. Em dikarin bi vî rengî ewên destan bi temamî gotî bidin nasîn.

-Ebdulqadirê Gwîzereşî (Abdülkadir Kızılkaya): Xelkê gundê Gwîzereşa (Cevizli) ser bi navçeya Çelê (Çukurca) ya Culemêrgê (Hakkari) ye. Ji 70 saliyê boriye. Ji bilî Kurdî, Tirkî jî dizane. Xwedan bîr û hafizeyeke gelek bi hêz e. Niha li Culemêrdê niştecih e. Wî, ev destan di kaseteke 96 dq'yî da vegotiye.

-Sadiqê Şetinîsî (Sadık Yılmaz): Xelkê gundê Şetinîsa Jorî (Yukarı Kayacık) a girêdayî Culemêrgê ye. Di vegotina destan û serhatîyan da destekî bilind hebû. Di sala 1994ê di 54 saliya xwe da çûye ber dilovaniya Xudê. Wî, ev destane di kaseteke 92 dq'yî da vegotiye.

-Ebdülkerîm Zawîteyî (Abdülkerim Akar): Xelkê gundê Zawîteya (Kayalık) ser bi navçeya Çelê (Çukurca) ya Culemêrgê ye. 55 salî ye. Niha di Mudîriyeta Çandê ya Culemêrgê da wekî memûr dixebite. Lîse (amadeyî) qedandiye. Wî, ev destan di kaseteke 84 dq'yî da vegotiye.

-Ehmedê Bayî (Ahmet Coşkun): Xelkê Gundê Bayê (Bay) ya ser bi Culemêrgê ve ye. Di sala 1997ê da di 65 saliya xwe da çûye ber dilovaniya Xudê. Wî, ev destan di kaseteke 45'yî da vegotiye.

-Ehmedê Asmîne (Ahmet Şen): Xelkê gundê Hirkaşê (Kınıklı) ya ser bi navçeya Çelê ya girêdayî Culemêrgê ye. Ji 100 saliyê boriye. Vê gavê li Çelê niştecih e. Wî, ev destan di kaseteke 30 dq'yî da vegotiye.

Dengbêj û beytbêjên hinek çiq û tayên vê destanê ji bo me gotî jî eve ne.

-H. Ebdilayê Keleş (Abdullah Demir): Xelkê gundê Marifanê (Kurudere) ya ser bi navçeya Çelêya Culemêrgê ye. 75 salî ye. Lîse qedandiye. Ji Mudîriyeta Perwerdeya Millî ya Culemêrgê teqawîd bûye. Niha li Culemêrgê niştecih e. Wî, ev destan di kaseteke 44 dq'yî da vegotiye.

-Leşker Şivîşkî (Leşker Demir): Xelkê gundê Şivîşka (Kavaklı) ser bi navçeya Çelêya Culemêrgê ye. Dêrdora 60 salî ye. Di Mudîriyeta Îtfaiyê ya Belediya Culemêrgê da dixebite. Niha li Culemêrgê niştecih e. Wî, ev destan di kaseteke 15 dq'yî da vegotiye.

-Selîm Peyanîsî (Selim?): Xelkê gundê Peyanîsa (Geçitli) ser bi Culemêrgê ye. 70 salî ye. Li gundê xwe niştecih e û bi cotyariyê ve meşxûl e. Wî, ev destan di kaseteke 14 dq'yî da vegotiye.

-Seyyîd Omer Kelêtanî (Ömer Demir): Xelkê gundê Kelêtanê (Taşbaşı) ya ser bi Culemêrgê ye. 79 salî ye. Li gundê xwe niştecih e û bi cotyariyê ve meşxûl e. Wî, ev destan di kaseteke 12 dq'yî da vegotiye.

-H. Îskenderê Biyadiyî (İskender Akar): Xelkê gundê Biyadiya (Narlı) ser bi navçeya Çelê ya girêdayî Culemêrgê ye. Nêzikî 100 salê bûye. Li gundê xwe niştecih e. Wî, ev destan di kaseteke 5 dq'yî da vegotiye.

1.1.4. Ji Aliyê Ruxsarî ve Destana Kela Dimdim

Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn, ya me li devera Hekariyan tomarkirî nêzikî heftsed bendî ye. Destan di nava xwe da li dû mijarê dabeşî heft beşan dibe. Bi benda:

*“Xulimîne xulimîne
Gelî xelk û alemîne
Guh biden dil û yeqîne*

4.1. BEŞA YEKEM



Navê Xanê Lepzêrîn yê rastîn Umer e. Ew xelkê Hizarcotê³² ye. Babê wî hêj ew biçûk miribû, lewra semyanê wî dayika wî Le'lixan bû. Rojekê xewnekê dibînît ku roj û heyv pêkve têne mala wî da. Ew gelek ma di bin tesîra xewna xwe da. Diçît nik melayekî û tabîra xewna xwe jê dipirsît. Mela dibêjîte wî: *"Tu dê gencxaneyeke gelek mezin bibînî. Tu dê bişêy bi saya wê gencxanê heft salan şerê dewletê bikey. Mişext, mêrkuj û mêrxas dê li dora te kom bibin. Navûdengê te dê gelek belav bibît. Tu dê bimirî, lêbelê navûdengê te dê li dinyayê bimînît."* Paşê Xanê Lepzêrîn li welatê xwe Hizarcotê xwîndar dibît. Lewra terka welatê xwe diket û tete nik Şahê 'Ecem.

Xulimîne xulimîne
Gelî xelk û alemîne
Guh biden dil û yeqîne
Qiseta Xanê Lepzêrîn e

Qiseta Xanê Zerîndest e
Kemera xîretê beste
Xelkê xweşmêr dane deste

Xelkê xweşmêr dane vê ra
Wê d'bestin kemerêd zêra
Navûdeng dinyayê gêra

32 **Hizarcot:** Gundek e li devera Akrê, li nav Zêbariyan.

4.2. BEŞA DUYEM



Êdî piştî hîngê Şahî, Xanê Lepzêrîn kir aqilmendê xwe û bêyî wî çî biryar nedidan. Xan jî wekî mirovekî têgehiştî û aqildar rêk nîşanî Şahî dida. Şahî gelek ji Xanî hez dikir û qedrekî mezin didayê. Rojekê Şah û Xan herdu pêkve çûne Deşta Hozanê rav û seyranê. Li wê derê rastî şivanekî hatin. Li nik şivanî rûniştin xwarê û bêhna xwe vedan. Şivan jî rabû miheke reş dot, şîrê wê kire kodekê û îna dana li ber mêvanên xwe. Paşî jî çû ber pezê xwe. Wan jî şîrê xwe vexwar. Şahî got: “Xano! bo min bêhnekê bilûrê lêde da ez li ber dengê bilûrê ra binivim.” Xanî jî bilûr lêda û Şah li ber denge bilûrê xewê girt.

Rojek ji nava rojan e
Şahî got: “ hey Xan e, Xan e
Bêhnek b'çîn rav û seyranê
Rav berdeyn Deşta Hozane”

Rojêk ji rojên Xudê ye
Xan û Şah herdu çûyîne
Nava deştê da meşîne
Ser kerek pezî helbîne
Nik şivanî rûniştîne

Şivanî wê lezandiye
Miheke reş bo dotiye
Tijî kodê şîr kiriye
Deyna ber Xan û Şahiye

Bilûrbêj e tembûrvan e
Kîs hejandî ber tilyane
Tembûr êxist ber milane
Bilûr êxist ber lêvane
Anferim Xanê Kurdane

Xewa Şahî wê hatiye
Xanî bilûr bo gotiye
Şahî di ber ra xew çûye

Dema Şah nivistî Xanî jî bilûra xwe dana li ser koda tijî şîr. Di wê navberê da mêşek ji kepê (pozê) Şahî derkeft, di nava bilûra li ser koda şîrî da derbas bû û çû li nav keleka kevîran da li ser kevîrekî rawesta. Paşê dîsa li ser wî kevîrî rabû, li nava bilûrê derbas bû û çû kepê Şahî da. Şah bêhniştî û ji xewê hijyar bû. Xan şaş û heybetî ma. Şahî got: “Xano! Min xewnek ‘ecêb dît.” Xanî got: “Şah xweş bît! Te çî xewin dît”? Şahî got: “Min di xewna xwe da dît ez li ser behreke spî di pireke kun (qul) da derbas bûm û çûme di nava gencîneyekê (xezîneyekê) da ku gelek gelek zêr û zînet têda hebûn.”

Xanî bilûr betal kirî
Deynabû ser kodê şîrî
Wêkî pirekê çêkirî

Şahî xewnê da dîtiye
Xanî b' çavêd xwe dîtiye
Tişabetek ‘ecêbiye
Mêşek kepê Şahî derkeftiye
Textena kodê kiriye
Hindava koda şîriye
Nav bilûrê ra çûyiye
Li ser berekî rûniştiye

Mêş ji ser berî rabûye
Ji bilûrê derbaz bûye
Textena Şahî kiriye
Çûye ser lêva Şahiye

Xanê Lepzêrîn gencîneyeke gelek mezin dîtibû, lêbelê nedizani kanê dê bi wê gencînê ve çi biket. Şevê Xewsê Bexdayê (Şêx Ebdulqadirê Geylanî) hate xewna Xanî û gote Xanî: “*Ez qasidê Xudê me. Xudê ev gencîne da te, da tu pê şerê ‘Eceman bikey’*”:

Hate xewnê Xewsê Bexdayê
“Tancê ‘Ecem kêr te nayê
Rabe dê lê vekeyn xezayê”

4.3. BEŞA SÊYEM



Rojekê Xanê Lepzêrîn mala xwe hemî kom kir û ji serî heta binî behsa gencînê û xewna xwe bo wan kir. Dayika wî û kurên wî jî gotin: “*Madem Xudê xezaya digel ‘Eceman ji me dixwazît, divêt em jî teqsîriyê nekeyn û berheviyên şerî bikeyn.*” Wesa qerara xwe dan, berê dê keleke qaîm ava biken û paşê dê li nav Kurdistanê bigerin û çend kesên merxas û egîd hebin dê di kelê da kom biken. Zad û zexîre, çek û silahê bo şerî pêdivî jî dê kom biken. Paşê jî dê şerê ‘Ecemî biken.

Dayika Xanî got: “*Kurê min here nik Şahî û hindî çermê gayî erdî ji dera hûn çûne rav û seyranê jê bixwaze.*” Xan jî çû dîwana Şahî û erdeki hindî çermê gayî jê xwest. Şah çî me’na neda daxwaza Xanî. Xelîfe ji vê gotina Xanî kefte şikê û gote Şahî: “*Ev Xane dê me bixapînit.*” Belê hindî Şah ji Xanê Lepzêrîn piştrast bû, qanîh bû û got: “*Xano! ew erdê me rav û seyran lê kirî hindî çermê gayî, min erd da te û here wê derê bo xwe xaniyekî ava bike.*”

Dayka Xanê Kurdan d’bête:
“Heke şerm e heke kirêt e
Me ev xulamîye nevête
Dûmahî dê bîn fihête”

Rojêke ji yêd Xudê dayî
Dayka Xanî d’bête Xanî
“Tu rabe here dîwana Şayî
Erdî jê bixwaze hindî çermê gayî”

Hatî Kanîna biçûke
Befrê wê girtin gedûke
Xanî ava kir qesr û qusor û birc û sûke
Bo kurê xwe îna bûke

Hatî Kanîna Mezine
Befrê girtin terazine
Xanî ava kir qesr û qusor û ser û bine
Bo kure xwe îna jîne

Çi sibe ye, roje tav e
Govendek şêran gêra ve
Xan Perî bûk e, Ebdal Beg zava

4.4. BEŞA ÇAREM



Xanê Lepzêrin dema Kela Dimdim tamam kir û daweta kurê xwe kir; li nav gund û bajêrêd Kurdistanê geriya û kî derê mirovekî zîrek û mêrxas hebît îna kelê. Pirsyar kir kanê çî qût û xwarin zû xirab nabît. Şarezayan gotê: *“Heke dexlî bi ûşî ve embar bikey heft salan xirab nabît, dê xwe bigirît.”* Ewî qûtê dexl û danî bi ûşî ve kom kir û tijî embarên kelê kir. Nav û dengê Xanî li nav Kurdan belav bû. Xan Ebdalê Mukrî jî mirovekî feqîr bû. Dema bihîst Xanê Kurdan daweta kurê xwe kiriye, ew jî landikekê (dergûşekê) çêdiket û qesta Kela Dimdimê diket da ku diyarî bidete Xanî û da Xan jî şabaşekê bidete wî. Xanê Lepzêrin jî tebdîla qiyafet kiribû û ji kelê derkeftibû. Berê xwe didetê ku zelamek ji wê ve têt û landikek li mil e. Xanê Lepzêrin gotê: *“Te xêr e zelum.”* Xanê Mukrî jî got: *“Min landikek çêkiriye dê bo Xanê Kurdan bibem. Belkî şabaşekê bidete min. Ez jî zarokên xwe pê xudan bikem.”* Xanê Lepzêrin gotê: *“Xanê Kurdan mirovekî mûn e. Hewceyî bi landika te ya darîn nîne.”* Xanê Mukrî got: *“Heke şabaş da baş e. Heke neda jî ji k..ê kerê min ve. Min çî minet pê nîne.”* Xanê Lepzêrin got: *“Tu dê biwêrî li nik wî jî wiha bibêjî.”* Xanê Mukrî got: *“Dê nik wî jî wesa bibêjim. Ma dê jê bitirsim?”* Dema Xanê Lepzêrin eve bihîst, zivirî hate kelê û cilêd xwe guhorîn. Xulam hatin û gotin: *“Xano! Yek dixwazît te bibînît.”* Wî jî got: *“Bila bêt.”* Xanê Mukrî hate jûr û got: *“Ezbenî! Ev e landikeke darîn e, min diyarî bo te îna da tu şabaşekê bideye min.”* Xanî got: *“Maxirab! Ez dê çî bi landika te bikem. Here bibe min nevet û çî şabaşan jî nadem te.”* Mukrî got: *“Heke şabaşê bidey baş e, heke nedey jî mineta te k..ê kerê min ve.”* Xanê Lepzêrin têgehişt ku eve mirovekî zîrek û mêrxas e. Ji kursiya xwe hate xwarê û Xanê Mukrî hembêz kir û

4.5. BEŞA PÛNCÛM



Şahî gote Xelîfe: “Ordîyekê rake here Kela Dimdim dîsa dorpêç bike û rezekî jî bo min dane. Heke hêj berê rezê min nehafî tu kelê bistînî baş e. Heke rezê min berê xwe da û te hêj kele nestandî hîngê ez dê bi ordîyeke gelek mezin ve bême wê derê.” Xelîfe jî ordiya xwe rakir û Kela Dimdim dorpêç kir. Rezek jî dana. Sê salan bê navber Kela Dimdim topbaran kirin, lêbelê neşîyan kelê bistînin. Sala sêyê rezê Şahî berê xwe da. Şahî got: “Madem sê sal derbas bûn û rezê min jî berê xwe da û hêj Kela Dimdim nehatiye standin cabê bo hemî ‘Ecematê û Îranê rêken bila hemî Xanên Îranê leşkerê xwe kom biken û bèn.” Kaxez û name bo hemî aliyên Îranê hatin belavkirin û Xanên ‘Eceman bi leşkerên xwe ve hatin harî Şahî. Şah bi ordiya xwe ve hat û Kela Dimdim dorpêç kir. Demildest dest bi topbarandineke xurt kirin. Paşê tancê xwe rêkir bo Xanê Kurdan ku vî tancî qebûl biket û biramûsît. Lêbelê Xanê Kurdan got: “Ez Kurdîniyê be nav û bê namûs nakem, lewra tancê te qebûl nakem.”

Şahî got: “Xelîfe zû ke, bilezîne
Rezekî bo min biçîne”
Heta berê rezê xwe nebîne
Ordîyê ser Xanê Kurdan nahelîne

Xelîfe lez kir lezandî
Xox û zerdelî îrandî
Rezek bo şahî danandî

Rez û bax danandîne
Berê wan pê ve hatîne

Çi çare pê nebirîne
Sê sal çûye temamiye
Dara zerdelî girtiye
Şahî berê rezê xwe xwariye

Gote Xelîfe:
“Qewl û qerar tamam bûye
Min berê rezê xwe xwariye
Min Xanê Lepzêrîn negirtiye”

Zû biken zû bilezînin
Kenefêd xîvetan qetînin
Ordîya mezin ser Xanê Kurdan helînin

“Lez biken û bilezînin
Destî b’ qeleman b’sidînîn
Ser kaxezan bireşînîn
Gund û welatan bijînîn
‘Ecematê vecemînin
Koma mezin bo min bînin”

Wan lez kir, wan lezandî
Dest li qeleman şîdandî
Wê ser kaxezan reşandî
Gund û welatan bijandî
‘Ecematê vecemandî

Zivistan çû, hat bihare
Hun leşkeran biken kare
Xanê Kurdan d’gel me xwar e

Bihar çû, hatî havîne
Dê leşkeran vecemîne
Xanê Kurdan d’gel me xaîn e

Havîn çû, hatî payîze
Dê leşkeran bitewîze
Me w Xanê Kurdan xwînîz e

4.7. BEŞA HEFTEM



Xanê Kurdan û leşkerê xwe heyameka dî şerê xwe kirin. Piştî ava baranê jî hêdî hêdî kêr dibe, derfetên berxwedana kelê jî kêr bû. Hîngê Xanê Kurdan gote dayika xwe: *“Daye! Ez çi bikem? Kes bi hewara me nehat û ava me jî êdî yê kêr dibît.”* Dayika wî gotê: *“Kurê min! Destê xwe bide şîrê xwe û tu û leşkerê xwe dakevin meydanê. Bi mêranî şerê xwe biken da nav û dengê mêraniya we li dinyayê belav bibît.”* Xanê Kurdan jî gotê: *“Bila daye, dê wesa bikem, wekî te divêt.”* Paşê caba kurê xwe Ebdal Begê jî rêkir da ew jî betin.

Xan dibêt:

“Herê daye, herê dayê
Tu bike teybîr û rayê
Hewar çûn qolê Bexdayê
Bê hîvî me, îmdad nayê”

Dayka Xanî dibêt Xanî:

“Xano, kurê dêleşêrê
Dest b’de şîrî here gêrê
Xudê berxê nêr da bo kêrê”

Xanî got:

“Nehavêje hişketane
Dê dest bavêjim çekane
Tine dê b’çime meydane”

“Hey Xano, kurê Momê
Bes bikêşe evê domê
Dest b’de şîrî here komê
Heke newêrî ez wê çûmê
Da nav biçît Erzeromê

Hey Xano, sere hîviyê
Tu nekêşe rezîliyê
Dest b’de şîrî here zeviyê
Heke newêrî bide sitiye
Da nav biçît Kurmanciyê

Hey Xano, sere dewletê
Tu nekêşe rezaletê
Dest bide şîrî here dawetê
Heke newêrî bide metê
Da nav biçît nav hukmetê

Tu Xan î, Xanê Kurdan î
Melevanê bin behran î
Delîletêd şolan d’zanî

Herê Xano, berxê dayê
Dest b’de şîrî here xezayê
Bike tarîx li dinyayê”

Xan dibêt:

“Herê dayê herê dayê
Ez Xan im, Xanê boxe me
Pîremêrekî kone me
Têra gereka dî heme
Ne xasme ku kurê te me

Herê daye, herê dayê
Sibeyî were bêlayê
Em çend mêr dê çîn xezayê”



Wekî tê zanîn edebiyata Kurdî li ser çar hêmanan hatiye avakirin: Ziman, edebiyata klasîk, edebiyata nûjen û edebiyata devkî.

Ji van hêmanan ya dewlemendtir jî edebiyata devkî ye. Piştî serdema modern, edebiyata devkî bi metirsiya nemanê ve rûbirû maye. Bi taybetî jî gelên bê desthilatdar zêdetir bi vê metirsiyê ra rûbirû mane. Kurd jî yek ji van neteweyan in.

Heta niha di warê edebiyata devkî da ji aliyê vekolîner û pisporên biyanî û xuyanî ve herçend xebat hatibin kirin jî ji ber rewşa Kurdan û Kurdî gelek kêmasiyên van xebatan çêbûne. Lewra divê bi çavekî zanistî edebiyata devkî bê tomarkirin û ev materyalên hatine tomarkirin bi çavekî zanistî bêne tûjandin, senifandin û nirxandin.

Di vê xebatê da jî yek ji girîngtirîn destana neteweyî ya edebiyata Kurdî, Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn hatiye tomarkirin û nirxandin.



9 786059 413633